RAWESTGEHA DAWÎN

Rêyek ûsa heye ku, ji mirov re rast xuya dike, lê belê dawiya wê mirin e. *M. Silêman 14,12*

Ji ber ku Xwedê dizanîbûn jî, dîsa wî bi Xwedayî bilind nekirin û ji wî re şikir nekirin; lê belê di fikrên xwe de ketin ehmeqiyê; tariyê jî dilê wanî fêhm nake girt. Wan, rastiya Xwedê bi derewê ve guhertin û ji Xalik zêdetir, bi mexlûq ve peristîn û qûlitiyê kirin; ew abadîn bimbarek e! Amîn. *N.Romiyan 1,21 û 25*

Nexapin; Xwedê nayê qerf kirinê! Ji ber ku mirov çi biçîne, dê wê jî bidirûnîne. *N.Galatiyan 6,7*

Û carekê mirin û paşî wê daraz bûn çawa qedera mirovan e, bi vî awayî, Mesîh jî bona gunehê gellekan li xwe bar bike carekê hate qurban kirin; cara duwemîn, ne ji bona gunehan, lê bona yên li benda wî ne xelas bike dê xuyayî wan bibe. *N.Îbraniyan 9,27-28*

Canê ku sûc kiriye, yê ku bimire ew e… Û ger zilamê xerab ji hemû sûcên ku kiriye vegere, helbet dê bijî, dê nemire. Gelo ez ji mirina zilamê xerab zewqê digirim; ma ne zêdetir ew ji rêyên xwe vegere û bijî? Gotina Xudan, XUDAN. *Hêzekîêl 18,20.21.23*

Kurdisch (Das Ziel)

Ji ber ku Xwedê evqas pirr ji dinê hez kir ku, Lawê xwe yê tekane da; da ku, bila tu kes, ji yên bawerî bi wî bîne helaq nebe, lê bila jiyana wî ya abadîn hebe.

Yûhena 3,16

Lê belê Xwedê, ji me hezkirina xwe bi vêya îspat dike: Gava ku hîn em gunehkar bûn, Mesîh bona me mir.

N.Romiyan 5,8

Bi vî awayî bona ku gunehên we bên paqijkirin tobe bikin û vegerin, da ku, bila ji ber Xudan wextên nûbûnê werin.

K.Şagirtan 3,19

Mizgîniya Mesîh bona xelasiya her bawerkiran hêza Xwedê ye.

N.Romiyan 1,16

Di rêya dadiyê de, pêşengiyê ji dilnizman re dike û rêya xwe hînî wan dike.

Zebûr 25,9

Rêya xwe ji XUDAN re bihêle û bi wî bawer bibe, dê ew ê jî baş bike!

Zebûr 37,5

Îsa ji wî re got: Rê, rastî û jiyan ez im; heta ku ne bi navberiya min be, tu kes nikare were cem Xwedê, (yanê bihuştê)!

Yûhena 14,6

Navnîşana Me Ev e: Hoffnung und Leben e. V.,
Postfach 10 13 82, 33513 Bielefeld, Germany